HELEBCE

BIRÎNEK E SAR NABE

Bavê Havî

Li sipêdeya 16 ê Adara 1988 di demekî de cejina Newrozê nêzîk bûbû, xelkê bajêr xwe berhev dikir û di gel kamilana biharê zerî û gênc û lawan çav lê bûn kengî seyranekî lê ji nişkekê ve, li wê sibeha sayî refek e firokên şerkerê Îraqê li asimanê bajarê Helebce xwiya bûn û jehra xwe darêtine ser û di encam de pênc hezar kes ji xelkê wî bajêrî bi tolaz, pîr, jin û zarok ve şehîd ketin.

Di ser hindê re ku çi cihên bêlayen tûjandin li dor vê karesata mezin nekir, lê ji şûnwarên mezin ya vê karesatê tê zanîn ku heta niho jî xelkê wê ji ber lêdana bumbên kîmawî dinalin.

Terim li ser cade û kolanan û di nav malan de kevtibûn û bihna mirinê ji her cihî dihat û sîmayên wan hat bûn guherîn û têkçûbûn. Zêdebarê hindê giyanewer û teyr û balindeyên wê deverê jî, bi hezaran miribûn.

Helwestên navdewletî ji vê karasatê bêdengiyek e neçaverêkirî bû, çi navendên dewlî û Erebî û îslamî ji vê karesatê xeber nedan û civaka dewlî çi nîşan li gel peyda nebûn ji bo lêdan û gunihbarkirina rejîma Îraqê bi vê tawanê, di ser hindê re ku rêkevtina Lahay ya li 29-7-1899 ê hatiye morkirin bi kar anîna çekên kîmawî û gazên kujek qedexe kiriye û rêkevtina Waşinton jî li 1922 ê misoger kiriye ku nabe ev cûne çek e bête bi kar anîn, û pirotokola Cinêv jî bi kar anîna gazan di şeran de qedexe kiriye, lê rejîma Beis ev çend e li pêş çavên civata navdewletî û hemûyan jî xwe bêdeng kirin.

Îro ku Sedam Hisên û desteya wî di qefesa gunihbariyê de ne û dadgehkirina wan li dar e, bi vê helkevtê yê bi navê hemû qurbaniyên vê karesatê, ji dadgehê dixwazin ku Sedam û dîvelankên wî bi zûtirîn dem bigihine sizayê xwe yê adîlan e û qurbaniyên vê karesatê jî bêne qerebûkirin û neêne ji bîrkirin.

Silav li yada Helebce a şehîd.